Newroz Hejmar(63) Rûpel (4) Tebax 2005z – 2617k

Şahiya Rêberekî

Dîlan Zivingî

Di – 21- tîrmehê , sala-2005- an de , ez pêrgî dewat ű şahiyeke balikêş dihatim . Li ser çateriyekê , xelik li derdora zavê civiyabűn . Dahol ű zurine Lêdiketin, ken ű şahî , li ser rűyê hemiyan diyar bű . Lê tiştê bêtir , ku bala min dikşand; Ew pêlên xemgîniyê, li ser rűyê zavê nîşan didan . Wisan jî, bê dudilî, berve wî diçűm ű pîroz dikir . Jê dipirsîm , ez benî : Çima ev dewat ű şahiya te , bi vî rengî , li ser vê çateriyê ű di çarçeweke teng ű bi lez e ? . Bi serê min ű te be , pir pêjin ű xeyalên reş , di hiş ű mêjiyê min de li hevdu dikevin . Ku tu , yan mirovekî gunehekarî , an li ser jina xwe dizewicî. Da ku , ev dewata te , bi vî rengî mîna mirovekî sêwî , an ji xwe bitirs e .

De ka , bêje çêroka te çiye ? ! . Wî , bi rűkî berkenî , pêşewaziya min dikir . Bi şêtmayî , serî li min hildida , kesereke kűr dikşand . Bersiva min , weha dida ű digote : Ma ezê çi bêjim ű çi nebêjim , çêroka min dirêj e , çerxa felekê , têra xwe bi min lîstiye . Ez avêtime hembêza merc ű rojên pir dijwar . Bi kurtebirî, dikarim bibêjim: Gunehê min tenê , ew e ku : Xwedê , ez kurd dame ű xwedî bîr - bawer im , zora li ser gelê xwe yê Kurd li Sűriyê nasdikim .

Va ye bêtirî -30- salî ye , armanc ű dilxweziya min ku , ez li ser şop ű riya leheng ű nemirên mina **Celadet Bedir-xan** , **Noridîn Zaza** , **Osman Sebirî** ű H.W.D, ku wan bi serbilindî ű li beramberî evqas sal , ji bo ziman , dîrok ű pêkanîna hêvî ű armancên gelê Kurd , li vî welatê Şűriyê ye . Wê riyê , riya xebatê , ji nevî ű nifşên nű guha re nîşan didim …. : va ye temenê min , weke dixuye , nêzîkî pêncî sal e . Lê belê hê jî , bê cîh ű war im … Ne mal , ne jin , ne jî zar ű zêç im ….. Li ber çavdêrî ű bêbexitiya ev desthilata şoven … Bi kesereke kűr , gotinên xwe dibirîn … Hîngê , min dizanî ku , ew berpirsiyar ű rêberekî mezin e, ji tevgera nişтimanperwer ya gelê me ya kurd e …Min serê xwe jê re ű li pêş wî ditewand …Serkefitin ű rojên xweş , ji wî ű hemo hevriyên wî re hêvî dikir .

Lê belê , pir pirs , di serê min de , xwe hilididan . Ma gelo! . Ev ton zor ű setema bi vê rengî , li tu deverên cîhanê , ji bilî vî welatî hene . Hêjayî gotinêye , merov bi bîr bîne ku , Sűriya me , ji roja roj ve îmza xwe xistiye bin fîtik ű lîsta mafên mirovan ! Dewat ű şahî , li mirovên mina zavê me ; qedexe ye ! Çiqas diyare ku , Sűriya me , li îmza xwe ne xwedî ye . Lewre jî , ew rűreş ű gunehkar , li pêş xelikê der ű hundir welêt xwe nîşan didin ! .

Tuştê hêvî ű şahî dixiste dil , dilê mirov xweş ű hênik dikir ; ew bű : pêdarî ű berxwedana xebatkarên gelê me yê Kurd e . Rojên li pêş yên rastî demiqurasî , dadimendî , pêkanîna mafên merov ű milletên bindest e.

.